Çîrok

Stiranek ji dûr ve

Wehid Keleş

Demjimêr hêdî hêdî derbas dibû û çavê wî yên ziha bi rengên mirovan ve diçûn û dihatin, hêviyên sar û pûç di rûyê wan re didîtin ji ber ku xwe nasdikê û mirovên paytexta gemarê jî nas dike, wa paytexte, ma tiştek ma û te jê nestand

Birçîbûn û tirs û xemgîniya rojane û pora boz dibin sedem ji bo derbasnebûna temenî, lê rojên tirsê û tirsa nediyar neyarekî nenas e. Ev tirse min dikuje

Di nav mitêlê de tirs e, di kêşana çixarê de tirs e, di xwînê de, di vexwarinê de, di ken û girî de, di dilê min de, di dilê te de tirs e, xwe nekenîne, tu dikenî?

Di kenê te de tirsa mezin heye û tu nikarî xwe veşêrî.

Ez xwe diveşêrim lê careka din dîsa li xwe divegerim, xwe dibînim li ber wê pînê çi difroşim? Çibe ku nanek hebe Dilo û xwîşka xwe bixwin.

Qêrqêra bazirganên vê bazarê û livandina mirovan, hestek diafirand îşev êvara cejnê ye.

Çavên ziwa li demjimêrê dinêrîn dixwest ku bi karê wan kata girêde, da roj bi dawî nebe, da kesin tiştekî bikirin.

Çixare li du çixarê li jor dinêrî û li jêr dinêrî û mejî diçû dûr.

Di kûrayiya hestên xwe yên birîndar de, ban kurê xwe dikir: *"Dilo tu hîn li benda baboyî, yan tu razayî?"*

Dûman ji xwaringehê derdiket, bihna goştê biraştî di wê cadê de belav dibû.

Aveka miz bi ser zimanê wî diket û rûviyên vala, mîna mara xwe li hev dipêçan

Dîsa di kûrayiya hestên xwe de kazkaz dikir û bang dikir: *"Dilo te şîv xwariye, te çi xwariye, yan te birçî xew kiriye? Ez dizanim kurê min* xewa birîndara dihê, lê xewa te û babo nahê kurê min."

Zaroktiya Dilo û xewnên diya wî ya perîşan, tev bendewarin li benda vegera babo ne û babo li benda kiye?

Serê xwe hilda jor, peşkên baranê li nav çavên wî diketin, hawara xwe gehand yezdanê roj û şevê, tu merdbûna xwe bi min re bikî, ger ne ji bo min be, jovan zarokên guneh.

Destê xwe kir di bin çengê xwe de, qapûtê kevnare wê çi germ bike.

Şilava vale, yan zikê sar, yan odaya kirê, ya li ser serê wî çiyayî û yan hindirê şil û sar?

Cade hêdî hêdî vala dibû û şerê pisîkan li ser goşên gemare nîşan dida bese, bû demê çûna malê.

Pîna xwe da hev avêt ser milê xwe, ji dûr ve xatirê xwe ji Hecî xwest, her sal bi xêrxweşî be, Hecî ber diket û ji çavên wî yên kûr û rû yê qermiçî dizanî rewşa wî di çi rengî de, nexasim her roj wî dibîne.

Hecî ew rawestan û tûrikekî mezin kir di destê wî de û jê re got: "ev ji bo zarokên te ye, Xweda bi te re be here serexweşiyê."

Ji destê Hecî girt û di hindir wî de dilê wî xwe digûvaşt û dîsa bang Dilo kir: "Dilo bibûre, bizane bavê te ne pîs e, bi Xwedê ne pîs e, lê çi bikim baskê min şikestîne

Girnîjîneka melûl li ser lêvên ziwa raxist, xatirê xwe jê xwest

Bi laşekî pelixî û westiyayî, berê xwe da malê û dilê kul bi tena xwe dirajê derdên hezar salî.

Piştî nîva şevê geha ber deriyê malê, bihna kulîça ketibû taxê, li ser pêpelûnkê, li ber derî rûniştt, çavên xwe girtin û guhdar kir, dengê stiranekî ji dûr ve dihat.